

# LE MONDE *diplomatie* kurdî



Almanya: 3,50 Euro  
Welatên din: 4,00 Euro

Nîsan 2010 - Hejmar 6

www.lemondokurdi.com · info@lemondokurdi.com

32 Rûpel

## Bûrqa; axaftinên vala

SERGE HALIMI

Di yar e fransiyên ku hejmar minareyên li Swîsre'yê û jinên bi "bûrqa" yên li Fransa'yê (sê sed û şêst û heft kes (1)) agahdar in, ji yên dizanin ku xezîneya dewletê piştî stendina biryareka "teknîkî" ji alî desthilata tenfîzî ve 20 milyar euro wendakiriyê zêde ne. Bi rastî, beriya hejdeh mehan, li cihê ku hikûmeta Fransa'yê alîkariya ji bo bankayên li ber îflasê têxe ber şertê beşdariya bi sermiyanên wan yên ku dikaribûn piştê bîna firoto bi qazenceke girîng, wê deynek bi şertê ku, van bankayan bawer nedikir, da wan.

Bîst milyar euro qezenc gihîşt peredarên bankayan, hewatekê qasî kêmketina budce ya ewlekariya civakî ya sala borî ye (22 milyar euro), û dike çar car tevahiya hatina aborî ya salane ku dewlet pêktîne, dema ku ew ji du karmendên dibin xanenîşîn, cihê yekî tenê tişî dika.

Hatina li ser xwe ya Eniya Neteweyî di hilbijartinan de û bi awayekî giştî ya rastgirên ekstremîst li Ewropa'yê ne dûr in ji vî belawelakirina bala raya giştî di nav tekstê gengeşiyên erzan ku dikutin û pûşîkê babetên girîngtir de ku dibêjin ew pir zehmet in ji 'evdên xwedê' re.

Birêz Nicolas Sarkozy yê fiyaskoya hilbijartinên herêmî li dî wî ne, wê dest bi "reformaya mutaqafdan" bike. Ji ber girîngiya encamên civakî û samanî, ji niha ve em dizanin ku hikûmeta Fransa dixwaze xelkê bi "gotûbêja li ser bûrka ye" mijûl bike.

Helwest li hember vî manevreyê, esse ne bi awayê ku dide xwuyan herwekî parastina semboleke taristanîyê ye. Ji xwe, çenabê fêminîstên - mîr û jin- ku li dijî bûrkayê derdikevin, bi rasismê bîna gunehbarkirin. Lê çawa mirov, rastgirek ku hema

li herderê qedera xwe bi ya dêran, patriyarkê û bi nixên olî ve girêdaye û ku ji nişkave bi xwe hesiya ye ku dilxwazê la-yikbûnê, fêminîzmê û ramana azad e, wê pêkenokekê nebîne? Ji bo rastgiran jî, Îslam mûcîzeyan pêktîne!

Di sala 1988'an de, birêz George H.W. Bush şûna Ronald Reagan girt. Piştî kampanyayeka ji demogoyîyê balkêş ku tede daxwaza krîmînalîzekirina sotana alaya stêrkî kiribû. - Salê, ji carekê heta heft caran ev tişt çêdibe. - Bi wêrekiya ku em dikarin xeyal bikin, ji sedî 90'ê parlamenterên amerîkî tedbîrek çewsaneyî bi vî wateyê standin, lê dadgeha bilind ew neyîn kir. Di wê demê de bi xwe, yek ji hetîketiyên herî mezin di dîroka aborî ya Dewletên Yekgirtî yên Amerîka'yê, ya bankayên danîna pereyan ku Kongre'yê ew ji hukmê rêbazan azad kirine û dûre hatin talankirin ji hêla hîlebazên piştgirî, ji hêla hilbijêrên ku kampanyayên wan van hîlebazan finansê kiribûn. Di sala 1988'an de, bêje hema tu kesî pêjin ji xwe ne anîbûn li ser xetera xapandineka wiha, tevî ku ji berê ve dihat zanîn. Pir tevlihev bû, û dûre parastina alê mêjiyê herkesî dagirtibû.


Hetîketiya bankeyên danîna pereyan 500 milyar dolar li ser bacderên amerîkî kirin. Emê di nêzîk de bizanin ka bi rastî çî li pişt "bûrka" ye heye û ka bihayê wê li ser me çîye?

**Wergera ji fransî  
Sergo Omar**

(1) Ger hesabekî pir zelal ji hêla Rebeberiya Navendî ya Saloxdariya Hundi-rîn (DCRI) bê kirin!

## Bandora şerr û şiddetê li ser civaka kurd

İLHAN KIZILHAN\*



Ahmet Gümüştekin (*Qurbaniya Trûwa'yê*)  
(Derbarê hunermend de rûpel 31)

**D**ema di pirsgirêkên şiddetê de, weke şeweyê herî dijwar jî di şer de, mirov werin kuştin yan birîndar bibin (wateya vî jî ew e ku hin mirov hin mirovên din dikujin yan jî birîndar dikin), hingî ev rewş bi serê xwe xisleta civakekê yan jî civatekê gelekî diguhere. Ew xislet û karakterên civakan heta bi ferdan bi xwe diguhere, lewra wateyeke taybet a jidestdana jiyanî mirovan û pêkanîna şiddetê, ji bo endamên civakan heye. Di encama şerekî bi vî rengî de mirina mîr,

jin û zarokan ji bo tevahiya civakê serborîyê gelekî girîng û bitesîr e. Ev serborî hevîrê jiyana wan disitire. Li ser mijara, ka civak wê çawa pêşkeve û bi pirsgirêkên xwe re bike der, bandoreke mayînde li civakê dike.

Dema şiddeta fizîkî demdirêj be, hingî bandoreke wê ya ewqasî bi tesîr li ser civakê çêdibe, ku 'çandeke şiddetê' (Bar-Tal, 2000) pêk tîne. Ev tecrûbe û serborîya demdirêj a bi şiddetê re ya ku gelek nifşan digire nav xwe, di warê hisî de jî digihêje endamên civakê, wan dikşîne


nava ya diqewime û dikeve nav hilberandina civakî ango sazî û tevî agahdarkirinê yên civakê. Bi demê re mînakeke çandî pêk tê. Di nava vî mînakeke çandî de baweriya sereke ya civakî, ji bo bîranîna hevvelatîyên jiyanî xwe ji dest dayî pêkanîna rituel û merasîman û ji bo rûmet û bîranîna kesên hatin kuştin avakirina abîdeyan, hene. Bi guherandina bîrûbawerîyê û pêre jî rabûnîştîna endamên civakê, ev yek şopan li pey xwe dihêle. Bi daxwaza xwe ya ewlekariyê û paras-











Ahmet Gümüştekin (Tav û Deng)

ve, ev têkilî, ti ferqa xwe ji têkîliyên bazirganî yên Yekîtiya Sovyet'ê bi Rejîma Saddam re ji 1970'an heta 2003'an meşand, tineye. Bê gûman, ji salên nostaljiya "evîna platonîk" wêdetir wateya xwe tine ku Kurd, ji ber têkîliyên wê yên ji bo berjewendiyên aborî bi Tirkiye'yê re dimeşîne, ji Rûsya'yê bixeyide.

Lê belê li gorî bawerîya me fêde heye ku mirov tiştekî wiha bîne bîra rêveberên rûs: Têkoşîna kurd her çend bi gavên giran û azar bimeşe jî, divê hêza vê têkoşînê ya "hilweşandina rejîman" neyê jibîrkin. Nêzîka-

tiya dijber a Rûsya'yê ya li hemberî hebûna siyasî ya Kurdistan'ê her weke ku wê windahiyeke ciddî bi kurdan nede jiyandin, wê tiştekî cidî jî bi rûsan nede qezençkirin.

Ji aliyê din ve di vê pêvajoyê de ku em dikevin dehsala dûyemîn a sedsala 21. de, em dibînin ku li Rojhilata Navîn tekîliyên "stratejîk" û qada bandorê ya Rûsya'yê bi gelemperî bi komên marjînal ên oldar û îdeolojiyên sosyalîst re û rejîmên mehkûmî hilweşînê (mînak: Îran) re bi sînore. Rûsya, hêna bi israr siyaseta parastina statukoya li

herêmê dimeşîne. Bi awayekî dîrek û îndîrekt parastin û hîmayekirina saziyên paşverû teokratîk, monarşîk (mînak: Sûriye) û antî demokratîk û rejîmên nihêrvan (mînak: Tirkiye) di warê pîvanên demokrasiya hemdem a navneteweyî û ji aliyê exlaqa siyaseta demokratîk ve ti aliyê wê yê mafdar û were parastin tine ye.

Ji aliyê din ve dîrok; nîşandide ku li Rojhilata Navîn ên rejîmên statukoparêz ên bi navên "komar", "demokrasi" ku nîzama rêvebirinê ya serdama navîn tine bîra mirovan diparê-

zin bi sernakevin, berovajî vê yekê kesên hewil didin û vîna gûherîn û vegûhezîna vê yekê nîşan didin bi ser dikevin, mezin dibin û pêş dikevin.

Pêşketinên di salên destpêkê yên sedsala 21. de tînin, bi hemû aliyê xwe datîne holê ku li Rojhilata Navîn "sedsala kurdan" destpê kiriye. Kurdan, li herêmê li ser bîngeha gûhertina statukoyên paşverû vîneke bi hêz nîşan dane. Bê gûman, ji bo têkoşîna demokrasiyê ya ku kurd li dijî statukoparêzan dimeşîne, alîkariya helwestên hêzên derve yên gûherînxwaz jî

çêbûye.

Ji niha û pê ve li Rojhilata Navîn rêya bi bandorbûyîna ji parastina demokrasiya herêmê û azadiyan derbas dibe. Parastina rejîmên li ber hilweşandinê, her weke ku wê Rûsya'yê ji hêz û taqetê bixîne, dikare bibe sedem ku wê bi tevahî ji Rojhilata Navîn jî dûr bixîne.

*Ev nivîs ji bo Le Monde diplomatique kurdî hatiye nivîsandin.*

**Wergera ji tirkî  
Nurettin Akad**





## AFRÎKA

## Rexne li alîkariya navneteweyî?

ILKA VARI LAVOISIER



Ahmet Gümüştekin (Baxçeyê xeyalan)

**A**lîkariya navneteweyî “cotkariya bin-gehî xerab kir, sîstema parastina civakî hate xetîmandin, bi awayeke îndîrekt bû sebebê mirin û nexweşiyên ku dikaribûn neqewimîna (1).” Navenda Ewropa-Welatên Sêyemîn (Cetim) di bin dokûmanan de hatiye pelçiqandin. Alîkariya ku ji bo welatên feqîr tê dayîn pir kêr e, ew qasê derfetên ku ji bo qebûlîna penaberan, ji bo pêşxistina fransî li derve û ji bo bûrsên ku ji bo xwendevan tîne dayîn tîne. Çawa ku “hacetên ji bo dîplomasiya stratejîk a alîkariyê” tîne zelalkirin, cihên ku ev alîkarî tîne şandin wisa nîin, heman alîkarî di navbera welatên “dewlemendên nîftê û di bin dagirkeriyê de ne, ên ku rewşa wan li gorî her du awayan nîin e” de, bi awayeke ecêbê tengav kirin. Di sala 2008’an de her sê welatên ku zêdetir alîkariya navneteweyî girtin ev bûn ; Îraq, Nîjerya û Afganîstan... Saziya Cetim’ê derxistiye holê ku, ji bo tevlêbûneke baş li “Stratejiya ewlekariya şertên

tovkirina alîkariyê (...) ji aliyê aktorên heman karî (...) ên bihêz” were kirin, hedefên Neteweyên Yekgirtî xwe li ser esasê rewşên semptomên (kir-yara ji bo çareserkirina nexweşiyekê) tîne zelalkirin, ew li gorî feqîriyê zelal nabin.

Di vê demê de, digel ku li gorî rastiyê Başûr tim Bakur finance dike (2), kollektîfa cenevreyî tenê “alîkariyekê girseyî ya ji bo pêşvebirinê” didomîne. Rêbazên çareseriyê yê zehmet ji Swîsre’yê nayên, ew ji Afrîka’yê tîne anîn. Ew bi navê –bi awayeke heqaretwarî- “Alîkariya ne pêwîst û çareseriyên nû ji bo Afrîka’yê” hatine naskirin. Berhema aborînasê zambiyayî Dambissa Moyo (3) bang dike ku ev alîkariya navneteweyî were sekinandin. Lê belê, di derbarê siyasatên hevkarîyê de, ew pêşniyaz dike ku, ji bo deynê heman welatan, formulên sûprîz ji aliyê Bankeya Cihanê ve werin dîtin. Li vê derê zêdetir dia ji sektora taybetî û ji azadiya “dostên me yê çînî” re tîne kirin, amîn...

Weşanên Pambazuka (4) di-

yar dike ku, miqabilê rewşa heyî, ew bibiryar in ku berhemên ji bo çareseriyên bi feyde biweşînin. Aid to Africa: Redeemer or Coloniser? çardeh (14) nêrînen rewşên birîrên ku di derbarê alîkariya navneteweyî de, bi mînakên bêhempa mêjîyên xwe hêşandine anîye ba hev. Bi analîzkirina berheman tî dîtin ku kirîza aborî di rewşa heyî de wê neyê çareserkirin, lewre ew bangê li Neteweyên Afrîka’yê dikin ku xwe ji vê “dirêjkirina dema dagirkeriyê” muhafaza bikin (dê wiha were fêmkirin: şertên bi deynan ve girêdayî hatiye diyarkirin “li gorî dilê wan e”. Tê diyarkirin ku welatên rojavayî di pêşketina rewşa aborî ya Afrîka’yê de ti berjewendiyên xwe nabin, ew dixwazin ku sîstemekê herêmî were xurtkirin. Di nava wan rewşên birîran de Samir Amin hin pêşniyarên ku ligel Pambazuka hatine ziman digire dest û wan ji bo wergera fransîzî, ku ji Yash Tandon hatiye nivîsandin, bikar tîne.

Bi daxwaza dawînanîna li girêdana bi alîkariyê ev rewşên birîrê ugandayî balê dikêşîne ser siya-

seta girêdana “konseptî” ya hêzên ku alîkar (5). Bi awayeke taybetî ew konseptên pêşxistina encamên kin, bi hin alîyan ve tîne ziman. Bi rêbazê fêrbûyîne, ew pêşniyar dike ku, li gorî encamên aborî yê di navbera neteweyan de, sîstemekê bacdayînê were çêkirin. Ev gotin dabeşandina encamên dizî yê “alîkariya îdeolojîk” dide xûyan: Ev rastî rewatiya hin dewletên ku dixwazin bala xwe bikêşînin ser pêdiviyên bi hêzên ku ji wan re alîkariyê dikin û xwe ji berpirsyariyên xwe dûr dixin dike xeteriyê.

Ji bo pêşxistinekê “xwe naskirinê” ya demokratîk, wê em rihê Bandung şah bikin. Destekkirina beşê cotkariyê û pêşxistina bazara hindîrîn. Di cihê ku tim xwe li gorî alîkariya hêzên derve tenzîm bikin û pêdiviyên xwe bînin cih, divê wendabûna fonên dewletê were sekinandin... Di vî warî de gelek pêşniyarên konkret dikarin werin kirin. Gelek pêşniyaziyan din ji dikarin werin ziman û ev dikarin weke; “şereke din ê azadiyê” were dîtin. Ji ber ku Tandon di

zanistiya “pêşxistineke baş a neoliberal di cewherê xwe de zehmetiyên ji diparêze” de ye, her wiha ew jibîr tîne ku; “ya yekem ku di nava wan de ye ketiyê nava rihan.”

Wergera ji fransî  
Ahmet Dere

(1) Julie Chatel û Florian Rochat, Bi-bandor, bêteref, bêal? Nêrîna rexnedar a Bakur di derbarê hevkarîya ewrûpî de, (Efficace, neutre, désintéressé? Points de vue critiques du Nord sur la coopération européenne) CETIM, Genève, 2009, 192 rûpel, 6 euros.

(2) Di sala 2007’an de, welatên di rêya pêşketinê de nozdeh (19) milyar dolar deynê xwe dan (li gorî pîvana deynê xwe), ev mîqdar ji alîkariya ku wan girtibû pirtir bû.

(3) Dambissa Moyo, L’Aide fatale, Jean-Claude Lattès, Paris, 2009, 252 rûpel, 20 euros.

(4) Hakima Abbas, Yves Niyiragira, Aid to Africa: Redeemer or Coloniser?, Pambazuka Press, Cape Town, Dakar, Nairobi, Oxford, 2009, 204 rûpel, 13 euros.

(5) Yash Tandon, En finir avec la dépendance à l’aide, CETIM, Genève, 2009, 220 rûpel, 8 euros.









## ÎSRAÏL-FRANSA

## Tel Aviv ji Parîs'ê re dide ser hev

ALAIN GRESH\*

Ahmet Gümüstekin (*Xak û Ferîşte*)

**D**i Kanûn a sala 2009'an de, li Qudûs'ê polîsên Îsraîl'ê davêjin ser Navenda Çanda Fransa. Armanca wan ew e ku berpirsiyarên payebilind yên fîlîstinî ku xwe sipartine vê saziyê bikşînin lêpîrsînin.

Roja 22'ê Hazîrana 2009'an, leşkerên Îsraîl'ê Berpirsa Navenda Çanda Fransa ya Naplûs'ê bi darê zorê ji seyera wê ya diplomatîk derdixin, ew davêjin erdê û bi pihînan lêdixin. Yek ji

leşkeran hingê jê re wiha dibêje: "Ez dikarin te bikujim."

Di Çile ya 2009'an de, di dema êrişê Îsraîl'ê ya li hember Gaza'yê de, leşkerên Îsraîl'ê davêjin ser mala Berpirsê Navenda Çandê û karmendê konsolosxana Fransa M. Majdi Chakoura û dest datînin ser pere û zînetên mala wî. Di nava wan mehan de leşkeran ev helwesta xwe gelek caran dubare kirine û di ser de jî çend caran lêxistine û gule reşandine ser karmendên fransî.

Roja 11ê Hezîrana 2008'an, Alîkara Konsolosê Fransa yê Qudûs'ê Xanim Catherine

Hyver, li nêzî xeta Gaza'yê bi qasî 17 saetan tê binçavkirin û rûmata wê tê şikandin.

Serokwezîr Benyamin Netanyahu ji bo xatirê 'dostê xwe' Nikolas Sarkozy hewl da ku li Gaza'yê ji bo avakirina navendeke nû ya çanda fransî bibe alîkar. Lê heta niha ti pêşketin çênebûye. Îsraîl destûr nade ku pêdivî û alavên hewce yên ji bo navendê bikevin welêt. Helbet disa wek dîsa bi bahaneya ewlekariyê. Belkî jî wisa baştir e: Qet nebe, di dema êrişên nû de, ev avahî jî weke bi dehan avahi-yên din ku demekî bi alîkariya saziyên Yekîtiya Ewrûpa'yê ha-

tibûn avakirin, ji aliyê artêşa Îsraîl'ê ve nayê hilweşandin. Weke mînak ruxandina balafirgeha navnetewî ya Gaza'yê di sala 2000'î de. Yekîtiya Ewrûpa'yê hilweşandina vê balafirgehê şermazarkiribû û herwiha îlan kiribû ku ewê ji Îsraîl'ê tazmînat bixwazin. Em hêjî li benda wê tazmînatê ne.

Di gel wê helwesta Îsraîl'ê ku ewqas bi rûmeta nûnerên fransî leyîst û ew piçûk xistin, Rayedarên fransî ti reyaksiyoneke berbiçav nişan neda (1). Îsraîl wisa ji hedê xwe derket ku réxistina wî ya saloxdariyê Mossad'ê roja 19'ê Çile ya 2010'an, li Dubayî

di kuştina berpirsiyarê Hamas'ê de pasaportekî hemwelatîyê Fransa bikaranî. Lêbelê li ser vê bûyerê serokwezaretîya Fransa'yê berpirsiyarê karê derve yê Îsraîl'ê yê li Parîs'ê wezîfedar bi awayeke şermok vexwend da ku li ser mijarê jê agahiyan werbigire. Bila şik û gumana we tinebe ku Parîs li hember Îsraîl'ê anca ewqas dikare deng derbixe û pir naçe pêş!

Wisa xuya ye ku hikûmeta Fransa'yê yêdî him bûye qehra Îsraîl'ê bikişîne. Wezîrê Karê Derve yê Fransa'yê Bernard Kouchner di meha Mijdar a 2009'an de di dema serdana

\* Endamê redaksiyona *Le Monde diplomatique*.













## WELATÊ ŞER DI MANIÈRE DE VOIR DE

# “Afganîstan a ku nayê bidestxistin”

H ejmara dawî ya “Manière de Voir” dosyayê gelekî balkêş li ser mijara Afganîstan’ê amade kiriye. Yekem nivîsa Stephen Hugh Jones behsa Afganîstan a di salên 1965’an de tûşî şerê navxweyî hatibû dike. Hingê Afganîstan welatekî tamponê di navbera Yekîtiya Komarên Sosyalîst a Sovyet û Welatên Yekgirtî yê Amerîka’yê de bû û qebûl nedikir di hevgerînên li dijî Sovyetan de cih bigire. Darbeya leşkerî ya komarxwaz li dijî Melîk Zaher Şah ji aliyê Prens Mohamed Dawîd (17’ê Tîrmeha 1973’an) ve û bi piştgiriya komunîstan pêk hat. Ev yek weke ku Jean-Charles Blanc di nivîsa xwe de behs dike, girîngiya etnîstî, qebile û ya malbatên mezin li welatekî ku ti carî serjimar lê pêk nehate dide fêhmkirin.

Bi rejîma Dawîd re nakokiyên tevahiya politîkayên modernîzasyonê xurtir dibin: Azadiya jinan, reformên cotkariyê, daderiya qebileyan, tewazûnên etnîk, rola paştûnan... Bi darbeya Partiya Demokratîk ya Gelê Afgan (partiyeye komunist bû) di bihara 1978’an de rih bi dîrokê hat. Li gorî Jean-Alain Rouinsard û Claude Soulard bêyî erêkirina Moskova’yê ev darbeya leşkerî çêbû. Gelê Afganîstan’ê dû parçe bû: Alîgirên Xelq pesnê şoreşa demokratîk “ku çîna karkeran rêveberiya wê dikir” (wer xuya ye, xewn e) û alîgirên Parşam ên ku yekîtiya hemû çînen civakî dixwest. Di navbera van herdû aliyan de şerek qewimî ku tevahiya dema Sovyetê dewam kir.

Ji 1979’an û ji dema dagirkirîna Arteşa Sor û vir ve, Afganîstan dibe karîkatûra hevrikî û şerê Rojhilat û Rojava: Partiyeye komunist ku ji aliyê kesên din ve tê beralîkirin, axaftinên nakok li ser azadiyê, piştgiriya amerîkîyan ji bo hêzên muxalif, bi taybetî yê herî radikîl, Pakîstan’ê xwe xist nav meselê, hevrikî û dubendiya di navbera

Îslamabad û Delhi’yê de... Wisa xuya ye kêma kes orjînalîteya xurt a vî welatê parçebûyî dibîne, ku tê de her etnîstî parastina xwe bi xwe mîsoger dike û her mirovê biyanî weke dijmin tê dîtin (Jean-Christophe Victor “l’Islam, les paysans et le poids des traditions” ‘Islam, gundî û giraniya adetan’). Çawa beriya wê artêşa Brîtanya di sala 1842’de tûk çûbû, Aretêşa Sor jî wê li wir bi bin keta.

Tevî ku hin kesên din di nivîsên xwe de weke “şoreşgerên azadiyê” behsa Mucahîdan dikin jî, Olivier Roy ji xwe ve pirsê dike; “Şerê pîroz (cîhad)

yan şerê rizgariya neteweyî?” Lêkolîner di analîza xwe ya li ser avahiya civakî ya Afganîstan’ê de, ji niha ve li ser zehmetiyên li arteşên fermî wê pêre rûbirû bibin, agahdarîyan dide. Bûyerên weke serûbinbûna civakî û herikîna penaberan ber bi perestgehên Pakîstan’ê ve ji hev derdixe. Di sala 1989’an de, bi vekşîna hêzen Sovyet’ê û pişt-re serkeftina Mucahîdan di sala 1992’an de “dema kaosê” dide destpêkirin: Têkoşerên berê li ber xwe didan, hev dikujin û xelkê paytextê yê di bin barana bombeyên giran de mayî, ne xema wan e.

Tevî ku hêzên mezin eleqeya wan ji vî welatî re namîne, Pakîstan piştgiriya Talibanan dike da ku desthilatîyê bi dest bixin. Sedemên serkeftina wan û dîtinên wan li ser nîzama “Îslamî” di gotara Ahmed Rashid û Stéphanie Alix a bi navê “Qui sont les ‘étudiants en religion’ (xwendekarên ilmê dînê kî ne)?” tê vegotin. Hin biyografiyên li ser lîderên Talibanan ronî dikin ka “yên nû hatî” çawa bûn desthilatdar? Nivîsa Gilles Dorronsoro yê wê demê yek ji pisporên dawî bû ku bala xwe dida vî welatî, yê ku wê biqewimîn pêş dît.


Bandora êrîşên 11’ê Îlonê li Afganîstan’ê kir tê zanîn, yê ku êrîşa amerîkî dan destpêkirin heta niha jî vî welatî nas nakin. Heman mijarên “modernîst” yê dema Sovyet’ê îro bi awayekî birekûpekên ten ber çavan: Azadkirina jinê, reformên demokratîk, hîlbijartinên ji bo mafdar nîşandana dagirkirînê, tewazûna etnîk... Lîderên şer yê berê ku niha bûne hevgerîna Rojava ji nû ve hatin erdarkirin, ev yek rastiya wan piçekî jî naguhere (“Ces charniers si discrets ev mekîneyên kuştinê yê evqasî bêdeng” Mazar Shebergan û Jamie Doran). Yê ku ev dosya nexwendibe nikare ji nû ve xurtbûna Talibanan fêhm bike: Ne karmendên NY’yê yê nû hatî Afganîstan’ê, ne tabûrên artêşên fermî ku hêzekê şer bikar tînin, (“Drones, la mort qui vient du ciel Balefirên bê mirov, mirina ji azmanan tê” Laurent Checola û Edouard Pfimlin), ne jî fermandarên amerîkî ku ev şer heta bi Pakîstan’ê birin, heta bi çihê ku îro jêre dibêjin AFPK, nikarin yekê ji van fêhm bikin.

Mijareke ku di heman beşên dosyayê de tim heye, politîkaya Pakîstan’ê ya derbare Afganîstan’ê ye. Ew jî hevgirekî bêwîdan e ku hem afganan hem amerîkîyan hem jî rojavayîyan bi gîştî dixapîne û manipule dike. Lê belê herkes wê jî dizane: Pakîstan welatekî ku “di şerê li dijî terorîzmê û li dijî belavbûna çekên nukleer de” hevgirek e.

Afganîstan cihêkî bi sînoren jeopolîtîk e, welatê dema dirêj e. Dosyaya hatiye amadekirin rîtmî bûyerên dîroka vî welatî ya tijî û bi kîjan qertên xwe lîstiyê, vedibêje. Li ser herkesê xwedî erka biryardanê yê îdîa dike “siyaseteke wî ya afgan” heye, diviyabû xwendina vî dosyayê weke xwegahdarkirina destpêkê bihata ferzkirin.

PIERRE CONESA

Wergêra ji fransî  
Lokman Turgut




Hejmara dawî ya “Manière de Voir”









Ahmet Gümüştekin (*Ejderhayê çiyayê Albatre'yê*)

tanya'yê bûtçeya pirtûkxaneyan, a ji bo kirîna berheman, weke hemû programên din ên alîkariya ji bo xebatên civakê, hatiye sekinandin. Vê rewşê li ser programa norwêçî hinekê bandor çêkiribe jî ew di asteke piçûk de maye per capita<sup>1</sup>.

Em programa zêdetir radîkal hatiye meşandin bihêlin dawî, û ev ya herî kevn e: Xwedîtiya salonên civakî yên sînemayan. Tenzîmeke neteweyî ya salonên şaredarêyan, di derbarê derketina filmên nû de hemû derdoran pêwendîdar agahdar dike. Ev tenzîm dibe sedemê ku fil-

mên nû bigehêjin hemû herêmên ku li paş wate. Di çarçoveya vê programa alîkariya civakê de, nêzîkê dused (200) ekran ji bo sed û sî hezar (130 000) temaşevanan xizmetê dikan.

Li Oslo, dema ku filmên nû yên serkeftî ku ji aliyê Hollywood'ê ve derketine, werin ser ekranan, derhêner dikarin filmên din, ên hatina wan qels in, di warê aborî de, bigirin û wan di salonên mezin de nişan bidin ku pêşî li filmên ku nabin parçeyek çanda civakê bigirin.

Her wiha, bê ku bi kesî re qi-

recir were kirin, "bêqaydetiya norwêçî", rastiyeke xwe dide pêş: Li vî welatî sistemeke bêhempa hatiye çêkirin<sup>2</sup>. Ji Fransa'yê cudatir, vî welatî sazîyên xwe yên weke kilîda garantiya serxwebûna çandê nefiroto aborî. Bêguman, sandoqên dewletê tije ne, ev jî bûye sedemê ku programên, weke ya kirîna pirtûkan ji aliyê pirtûkxaneyan ve bimeşin. Lê belê kontrola rayedarên herêmî ya ji bo salonên sînemayan qasê pereyê ku ji petrolê tê hate niqaşkirin. Tişteke din ku me matmayî kiriyê jî ev e: Ev program di pir

aliyan de bûne sedemê ku di nava rayedarên sazîyên cûrbecûr de sistemeke rêveberiya baş pêşbikeve. Ev jî di nav salên dirêj de, bi awayeke pir zirav hatiye fikirandin. Jiber vê yekê mînaka norwêçî ku heta niha li-pêşkete, heq kiriye ku, bi dîqeteke pir mezin, binê wê were xetkirin.

**Wergera ji fransî  
Ahmet Dere**


(1) Bêguman ev hejmar ji yên Fransa'yê zêdetir, ku li vî welatî kirîna berheman ji aliyê pirtûkxaneyan ve di asteke pir marjînal de ye. Ne mumkun e ku em bikaribin li Fransa'yê vî hejmarê tespît bikin jî, jiber ku encama wan tenê ji aliyê dikanên pirtûkan û firmeyan ve têne kirin.

(2) Encamên di derbarê çapemeniyê û weşanan de ji agahiyên fermî yên hikûmetê hatine girtin. Agahiyên di derbarê sînemageriyê de ji gotareke pir baş ya Nils Klevjet Aas, ku di International Film Guide, 1988, ji aliyê National Association of Municipal Cinemas li Oslo ve ji nû ve çap bûye, hatiye girtin.









Jina helbestvan di hunera rojhilat de - Efekt LMD kurdî

bi wergerê nedihat xwestin ku tevnê, berovajî bikin û tenê gotin û bêjeyên ziwatekî li zimanên din wergerînin. Miguel de Cervantes, navên Luis Zapata û yê Horace bibîr anîbû û ecêbiya wergera bêje bi bêje bi vê gotinê anîbû ziman: ‘wek ku mirov berovajî li tevna xalîçeya filamanan binêre.’

Karê wergerê wezîfeyek pir zehmet û tevlihev e ku jêre merîfetên awerte divê: Wek ku mirov eslê tiştekî li ser zemîneke nû ava bike, wek ku mirov xezaya herêmekî bi gotin û bêjeyên biyanî dagir bike, yan jî wek ku mirov dara li gor avûhe- wayeke din kok girtibe li ser xakeke cuda dayne.

Di sala 1974’an de, Borges, di El Hacedor, de bi navê La Trama (Tevn li darxistin) nivîsek piçûk

weşand. Ez dixwazim vê nivîsê ji nûh ve li vê derê jî binivîsin.

“Tirsa di dilê wî de derketibû asteya herî bilind. Cesar, ji ber darbeyên giran yên xençeran ku ji hevalbendên xwe dixwar, li bin peykerekî êdî ji qidûm ketibû. Di nava ewqas devên xençer û serêyan de, ruyê Marcus Junius Brutus firq kir, delalîyê wî, dibe ku kurê wî be jî. Wê demê yêdî hewce nedît xwe ji darbeyan biparêze û wiha qêriya: ‘Ma tu jî, kurê min!’ Shakespeare û Quevedo ji vê derê, gazinc û qêrîna tijî hes, bi destxistine.

Kêfa qederê dihat ji dubareyan re, ji cihêrengî û ji simetrîyan re. Piştî Nonzdeh sedsalan, li başûrê bajarê Buenos Aires, şivanekî (gaucho) ji aliyê şivanên din ve tê lêdan, dema li

erdê dikeve, di nava êrişkaran de, kurê xwe yê watevî firq dike. Bi awirên matmayî, bi dilekî tijî gazinc, lê vedigere û bi dengêkî hêdî jê re dibêje: ‘Pero, che’ (Ev biwêj divê neyêne xwendin, tenê dema werin bîhîstin dikarin bigêhêjin wateya xwe). Ew wî dikujin, lê ew nizane ku bi mirina wî re sahneyek heman rengî xwe dubare dike.

Berî çend salan, bi aramca ku vê nivîsa Borges, bi hin dostên xwe yên kanadî re parvebikim, min xwest wê wergerînim îngîlîzî. Lê min pir zehmetî kişand, yek ji astengiyên asê, bi taybetî jî biwêja ‘Pero, che!’ bû. Ev îfade bi awayeke mukemmel nikare were wergerandin, ev gotin li ser xaka Arjantin’ê, ewqas ji kûr ve kok girtiye ku ne mumkune mirov karibe wî di

zeviyeye din ya ziman de ji nu ve dayne. ‘Pero, che’ dibe ku bûbe perçeyekî nasnameya Arjantin’ê. Gilî û gazinceke ewqas ji dil û ewas taybetî ye ku nikare li ti derekî din yê cihanê were bilêvkirin. Li Îngîltere û li Amerîka ya Yekgirtî ‘Pero, che’ nayê gotin, li Îspanya, li Meksika yan li Kuba’yê jî zêde nayê bikaranîn, ‘Pero, che’ gotineke taybetî ye û bûye wate û nasnameya axaftina kreolî.

Baş e ku dîroka wergerê ji muczeyên piçûk pêkhatiye. Bihnpakî, erdem, aqil, merîfet, tecrûbe, lêkolîn, tesaduf: Her yek ji van faktoran di pêkanîna wergerê serkeftî de dikeve dewrê. Lê dîsa jî di vî karî de, ya herî girîng û bingehîn, kalîteya mucîze ye. Di vê zeviya afirandina wêje de, serkeftineke bê

mucîze tine.

Nivîsareke koçerî ku ti car kon venagire.

Ew wergera ku ez nikaribûn ji nav dereketama, min dev jê berda. Bikaranîna bêjeyên weke hev serê min êşandibû. Ji bo hinek bala xwe sivik bikim û êşa serê xwe kêm bikim, min berhema Gilbert Keith Chesterton ya bi navê A Short History of England, xwend. Borges jî ev pirtûk baş nas dikir. Ji nişka ve ev hevok derket pêşberî min: ‘Demên dîr û dirêj, wiha dihat zanîn ku netewa brîtanîk ne ji aliyê Jules Cesar ve lê ji aliyê Brutus ve hatiye afirandin. Kontrast û dijberiya di navbera wê keşîfa rastîn û ya avabûneke fantastîk û xeyalî de, xaleke komîk heye. Mîna ku gotina bi latînî ya Jules César ‘Et tu, Brute?’ karibe di îngîlîzî de wisa were gotin: ‘What, you here?’ Biwêja ‘What, you here?’ ya Chesterton wergera mukemmel ya biwêja ‘Pero, che’ ye. Yan jî biwêja ‘Pero, che’ ya Borges wergera mukemmel ya ‘What, you here?’ e. Werger jî weke xwendinê di herdû îstiqametan de jî dikare rêwitiyê bike: ji çavkaniyê ber bi nivîsa orijinal ve, yan jî ji nivîsa orijinal ber bi çavkaniyê ve. Çavkanî û orijinal di wê rêwitiyê de pir caran wisa tevlihev dibin ku ji navhev dernakevin, û pir caran jî wateyên xwe diguherînin. Kî xwediyê berhemê ye, kî wergerê wan biwêjan e? Borges yan Chesterton? Ne mumkun e were zanîn. Kronolojî û anakronolojî bi gotineke din rastnivîs û çewtnivîsa tarîxan, têgehên ne hewce ne ji bo darizandina wergerêkî û ya çavkaniyên wê.

Xwendevanên ku di pirtûkxaneyan gerdûnê de derdikevin gera nivîs û berhemên ku xwe di wan de dibînin, dema kalîteya wergerê qebûl dikin, wezîfe û barê wan girantir dibe. Wê demê, nivîs û hevokên ji wê rûpelê tîr girtin, veduguhêzin nivîsen cûrbecûr ku di nava xezîneya bêjeyên xwendevan de reng diguherînin, di şiklên cuda de dibin xwedî wate, tecrûbeyên xerîb bi destdixin, dibin xwedî bîranînan nû û di refên pirtûkxaneyên cuda de tîr hilanîn.

Werger-xwendevan di şûna nivîseke sabît de ku ji şûna xwe nalebite, nivîseke koçerî ku ti car kon venagire û tim di nava tevegerê de ye, pêşniyaz dike. Vaye, paradoks û nakokiyên hunera wergerê ev in: Bicerhemeke wêjeyî di domahiya koçberiyê berdeyam de û bi xêra keşfê nû dikare hêz bigire, kêmtir wate buguherîne û bi awayeke mucîze bêmirînî dibe cezîre xezaya wê. Ji xwe xezaya hunerî ya berhemê jî tiştek wisa ferz dike.

**Wergera ji fransî  
Bedran Dere**

## VENEZÛELA

## Karakas li pey stratejiya pêşketinê de ye

MARK WEISBROT\*



Ahmet Gümüştekin (Heft sirrên gerdûnê)

**D**i serdana Brezîlyaya 2'ê Adarê de Wêzîra Karê Derve ya Dewletên Yekgirtî yên Amerîka'yê Hillary Clinton ji bo mîheke ji keriyê xwe qutbûyî ya li baxçeyê piştî mala xwe waezek kir: "Em hêvî dikin ku hukûmeta Venezûela'yê ji nûn ve (...) mulkiyeta şexsî misoger bike û li aboriya bazarê vegere (1)." Ti tiştî nû nîne. Ji 2003'an ve Venezûela'yê tevahiya rekorên mezînbûna aborî şikandin. Muxalîfên desthilatdariya heyî, di nava wan de Washington û piraniya çapemeniya navneteweyî jî hene, her "dinalin, di xemgîniya xwe de digirîn û hêvî dikin"

\* Hev-Dîrektore Center for Economic and Policy Research (Navenda ji bo Lêkolînên Aborî û Siyasetê), Washington.

çawa ku di navê strana rockvanê navdar Buddy Holly "Crying, waiting, hoping (girîn, li bendê mayîn, hêvîkirin)" de jî heye. Wan gelek nivîsî û got, guleya petrolê wê dereng neteqe, bi vê jî bûyerên li gorî dilê xwe anîn ziman.

Lêbelê; di nava 5 sal û nîvan de hilberîna hundir a brut a reel a Venezûela'yê ji sedî 95 zêde bû, xizani nîvî bi nîvî kêmbû û xizaniya zêde jî bêhtirî ji sedî 70'î kêmbû. Xercên civakî ên serê şênî sê caran ji ya berê zêdetir bû û di heman demê de gihiştina xizmeta tenduristiyê û perwerdeyê zexmtir jî gelekî baştir bû. Sala 2006'an hilbijêran bi piraniyeke ji sedî 63'an Serok Hogo Chavez hilbijart û minetdariya xwe nîşan da. Ev rêje ya herî zêde bû ku Chavez bi dest xistibû.

Her çawa be, piştî ku aboriya Dewletên Yekgirtî serberjêr çû, ber bi dawiya 2007'an ve, aborî dest pê kir bi pêşket. Di trîmestra dawî ya sala 2008'an de bihayê kurên petrolê bi awayekî gelekî zêde kêmbûn. Ji asta rekorê 99,5 euroyan daket 29,7 euroyan. Ji dema greva mezîna sektora petrolê ya salên 2002-2003'an ve Venezûela careke din bi krîza aborî re rûbirû bû; hilberandina hundir a brut sala 2009'an ji sedî 3.3 paşve ket. Daxwazên dijminên Chavez pêk hatin. Weke dema piştî oforiya di navbera 1973-1977'an ya şoka pêşi ya petrolê de, ev dana Xwedê ya reş (petrol) bi tenê dikare rê li ber hilweşîna aborî veke.

Gelo em dikarin evqasî ji vê yekê piştrast bin? Lêkolînên li ser xisletên vê krîzê nîşan didin

ku ev krîz ne bivê nevé bû. Lêçûna sektora taybet ji sala 2008'an ve kêmbûbû. Piştî ku bihayê petrolê gelekî kêmbûn, lêçûna vê sektorê bêhtir kêmbû. Wê wextê hukûmetê dikarî planeke rûhpêanîna sektora enerjîyê bixe dewrê, riya vê jî zêdekirina lêçûnên gelemperiyê bû da ku cihê ku ji daxwaza sektora taybet vala mayî tijî bike. Hukûmetê ev nekir. Berevajî, mezînbûna sektora gelemperiyê bi awayekî hişk kêmbû. Sala 2008'an rêjeya mezînbûnê ji sedî 16.3 bû, di 2009'an de ev rêje daket ji sedî 0.9'an.

Ji bo Fona Peryan a Navneteweyî (IMF) û hin saziyên din ên sektora finansê, ji mîjve ye mîsêwa du tiştên bi hev re hene: Welatên dewlemend, yên weke Dewletên Yekgirtî yan jî Brîtanya dikarin bi awayekî rewşa

destûrê bidin xwe ku bi gelêkî zêdeyî budçeyên xwe lêçûnên wan hebin, da ku li ber tesîrên paşveçûneke aborî xwe bigirin; welatên pêşdikevin divê ya berovajî vê bikin, ango lêçûnên sektora gelemperiyê kêmbikin û zêdeyî budçeya xwe mesrefê nekin. Heçî Çîn bû bi xêra planeke rûhpêanîna aborî ya mezîna bi awayekî serketî xwe ji qeyranê xilas kir û tevî aloziya aborî ya global jî di 2009'an de ji sedî 8.7 mezîna bû.

Hemin, avantaja hukûmeta çînî heye ku tevahiya sîstema bankeyan kontrol bike: Jê hat ku banke û saziyên malî neçarî dana krediyê bike, hêja ye mirov bizane ku lêçûn û pererazandîna gelemperiyê ji sedî 20'ê hilberandina hundir a brut in. Bolîvyaya, dewleteke ku qada wê ya watevrayê mezîna nîne, jê hat



PÎRTÛK

Rêwîtiya Fîl'ê

FRANÇOIE BARTHÉLÉMY



Scrabble

**E**ncamê hestên ku bi nexweşiyê hatiye xemilandin: Karêkte- rekî piçûk û bêhêvî, di rêyeke bûyerên girîng û bibandor de, kesayetiyên mezin û zilamên civakê, çalakiyên gelek xirab ên mirovan û xwepêşandanên biheybet ên xwezayê, diyalog û nivîsandin, pirs û bersivên ku tim hevdû di-şopînin, bê ku werin bidawîkin... Wisa dixûyê ku di vê romana José Saramago de "hemû tiştên xwezayê" çih digirin. Beriya hemû amadekariyên pirtûkekê li ser hêza xeyalan tê nexşekirin, heman pirtûk li ser bingeha bûyereke dîrokî ku xetên wê di arşivên neteweyên ewrûpî de veşartî ne hatiye nivîsandin. Emê bi tîpên mezin behsa xalên ku nivîskar zêde balê nekişandiye ser bikin.

Di sala 1551'an de, hukumdarê Portekîz'ê Joao III û xanima wî Catherine d'Autriche filekê bi navê Salomon diyariyê Archiduc (Prens) Maximilien d'Autriche kiriyê. "Çermê wê fila

Asya'yê, ku bi tenê bûye, feqîrok e, nîve nîv rengê wî gewr û qehweyî ye, bi lekeyan û bi pûrtê deqdeqokî bûye, di halê wî de diyar e ku ew di nava rewşeke xemgîn de ye, digel hemû wê halê wî de ew ji rewşa xwe razî be." Ev heywana biaqil di serê xwe yê mezin de pir fikran derbas dike, weke ku Buthro, hevalê wî ye ku ji Hindistan'ê hatiye, bi hestên xwe û hewesê dide der. Ew dikare, di derbarê zemanê me de, figûra xerîbiyê ku ji bo nanê xwe bilîze.

Di dema rêwîtiya bi kêştiyê ku ew hatin, ew û eskorta wan, ji Portekîz'ê heta Îspanya'yê, piştre ji ji Îspanya'yê heta Îtalya'yê, bi armanca ku bigehêjin Viyana'yê, li vê derê zilam û jina wî ewê ji xwe re bikin hacetê nîqaşên bi civakan re. Li heman derê civak di bin zexte olî de ne, rêveberiya keyfî ku roj bi roj bandora xwe fireh dike, pêkhatina bawermendiya girseyan bi awayeke çavgiştî, kiryarên derreke Katolîk ku li dijî Luther, digel ku ew mirî ye, neheqiyên

mezin kiriyê.

Bi armanca "kêmkirina bandora hêza protestan", rayedarên olî, bê ku teredût bikin, çalakiyên pir bixezeb dikin. Bi heweseke mezin, nivîskar ew bi xwe ji raberî êrişên heman dêrê hatiyê- bi awayeke vekirî dibêje çawa keşişekî Dêra Basilique ya Saint-Antoine, ya li Padoue'yê, ji Buthro dipirse ku ew dikare bikeve filekê bîne ser çokan: "Tenê li ser yek nîgekî bike." Nivîsandaniyekê kurt ya heywanan. "Li ber deriyê Basilique'yê li pêşiya girseyeke şahîd ku ji hemû zemanên pêşerojê re bûyerê tasdîk dike, fil a ku bi yek lêdanekê li ser guhê wî çokên xwe tewand, ne tenê yekê, ji bo ku keşe kîfxweş bibe wî herdu çokên xwe, li pêşiya hukumdarê xwedê ku li ser asîmanan e û her wiha li pêşiya nûnerên wî ku li ser erdê ne bihev re tewand."

Silav ji bo şahîd. Çava li ser hemû fen û fûtan vebikin, li hemû qirêjîyên siyasetmedarên ku dixwazin nav û şanên xwe

mezintir bikin, xapandina gelan ku ji aliyê fermanarên leşkerî ve, bi dirûşmeyên netewperest dikevin şeran... Nivîskarê mezin û ramanger Samarago me vexwendeyê fikrandinekê, weke ji duh heta îro, li ser hevpariya jiyana di navbera mirovan dike. Ev yek wisa tê kirin ku bêyî zêde ciddî were dîtin. Ew bi xwe jî amade ye ku bidîqet li kiryarên xwe binêre. Di dema rêwîtiyê de, karwan di nava mijekê sivik de derbas dibû, wî ev tişt baş nedît û wiha got: "Divê yek bi xwe ji xwe re biaxife ku bikaribe çend wêneyên wêjeyî, bê ku xwezaya wan hebe, bigire." Fersendeke din ji bo xwendevanan jî ew e ku ew lêvbiken bin.

(Nivîskar José Saramago, ji aliyê Geneviève Leibrich ve, ji portekîzî bo fransî hatiye wergerandin, Seul, Paris, 2009, 217 rûpel, bihayê wê 19 euro)

**Wergera ji fransî Ahmet Dere**

**Le Monde Diplomatique kurdî**  
Ji aliyê Independent Kurdish Medien Group GmbH ve tê weşandin

Editorê giştî  
Faysal Dağlı

**INDEPENDENT KURDISH MEDIEN GROUP GMBH**

Kaiser-Wilhelm-Ring 27-29  
50672 Köln / Almanyaya

Desteya rêvebirîyê  
Murat Satık  
Rıza Dinç  
Metin Göktepe  
Faysal Dağlı

**ALMANYA**  
**Le Monde Diplomatique kurdî (kurmancî)**

Şewirmenda weşanê  
Berivan Aymaz

Asistanta editor  
Semra Polat

Asistantê weşanê  
Sharo İbrahim Garip

Rêvebirê hunerî  
Hasan Hüseyin Deveci

Designer  
Mehmet Nazmi Demir

Tlf: 00 49 (0) 221 56 94 162  
Fax: 00 49 (0) 221 56 94 200  
info@lemondekurdi.com  
www.lemondekurdi.com

**KURDISTAN**  
**Le Monde Diplomatique kurdî (sorani)**

Ji aliyê Rûdaw Media Company ve tê weşandin

Tlf: 00 964 (0) 750 488 56 96  
info@lemondediplo-kurdi.com  
www.lemondediplo-kurdi.com

Rûdaw Media Company  
Caddeyî 100 Metre, Hewlêr,  
Kurdistan / Iraq

**FRANSA**  
**Le Monde Diplomatique**

Damezrêner  
Hubert Beuve-Méry

Rêvebir  
Serge Halimi

Sernûser  
Maurice Lemoine

Cigirê sernûser  
Martine Bulardi,  
Philippe Rivière, Anne-Cécile Robert

Redaksiyon  
Alain Gresh, Mona Chollet,  
Pierre Rimbart, Dominique Vidal

Rêvebirê hunerî  
Alice Barzilay

Dokumantasyon  
Olivier Pironet

Sekreter  
Sophie Durand, Monique Salomé

Tel: 00 33 (0) 153 94 96 01  
Fax: 00 33 (0) 153 94 96 26

1-3, rue Stephen-Pichon,  
F-75013, Paris

**ABONETÎ**  
Independent Kurdish Medien Group GmbH  
Post Bank  
Konto: 371219609 - BLZ: 50010060  
IBAN: DE84 5001 0060 0371 2196 09  
BIC: PBNKDEFF

**Almanya:**  
Salane: 50 Euro - 6 meh: 25 euro  
**Dervayê Almanya:**  
Salane: 60 Euro - 6 meh: 30 euro